



Programa Federal

„Kursa Integrasyonê ya bi Zarok: Bingeha Avakirina Siberojê“

Agahdariyên paraztinê yê derbarê bikaranîna daneyên şexsî

1 Agahdariyên Giştî

Berpîrsiyariya Programa Federal „Kursa Integrasyonê ya bi Zarok: Bingeha Avakirina Siberojê“ ku li ser Wezareta Federal ji bo Malbat, Kal û Pîr û Ciwanan ye û bi hevkarîya Wezareta Federal ya Karên Navxwe û Niştîmanî (BMI), tê fînansekirin (**Diravan dide**).

Ê **alîkariya diravî** dide Sazgeha Civakî ya bo Şewirmendiya Karsaziya Civakî (Gesellschaft für soziale Unternehmensberatung mbH), gsub e û weke sazgeheke nîvfermî ya dewletê ye.

Wekî dinê jî „**Xizmetguzeariya Kursa Integrasyonê ya bi Zarok**“ heye. Ev ARGE GbR ye û ji:

- gsub, Sazgeha Civakî ya bo Şewirmendiya Karsaziya Sosyal mbH,
- Weqfa SPI, Înstîtuya Pedogogiya Sosyal „Walter May“, pêk tê.

Sazgehên kursê didin teşwîq û alîkariya a diravî werdigrin (**Ê alîkariya diravî werdigre**). Ev sazgeh mafdar in ku kursên integrasyonê lidar bixin û bi armanca çavdêrî û lêmiqatebûna zarokên dê û bavên beşdarî kursan dibin, karmendên pîspor yê wargehên zarokan, wargehên lêmiqatebûna zarokan, bi şeweyeke daîmî yan jî karmendên ji bo vî şuxlî xwedî şîyan, bi şeweyeke demkî erkdar bikin.

Di vê programê de ji bo armancên cuda daneyên şexsî têne bikaranîn.

Li gorî Xala 4. Nr.7 ya biryarnameya bingehîn ((DSGVO) ya paraztina daneyan, berpîrsiyarê bikaranîna evan agahdariyan ev sazgeh e ku alîkariyê jî werdigre:

gsub, Sazgeha Civakî ya bo Şewirmendiya Karsaziya Sosyal
embH

Kronenstraße 6
10117 Berlin

2 Agahdariyên Pêwendiyê yên Karmendê Paraztina Daneyan

Hûn dikarin di ser datenschutz@gsub.de re xwe bighînin karmendê Paraztina Daneyan yê gsub, Sazgeha Civakî ya bo Şêwirmendiya Karsaziya Sosyal an jî hûn dikarin bi pêveka „der Datenschutzbeauftragte“ di ser navnîşana li jor destnîşankirî, xwe bighînin.

3 Ji bo çi armancê dane têne bikaranîn

- Ji bo kontrolkirina bicîhanîna mercên bikaranîna diravan û herweha kontrolkirina rast û di cîh de mesrefkirina diravên ji bo vê armancê hatine dayîn (destpêka alîkariyê, di dema birêvebirina projeyê û herwisa piştî bidawîbûna alîkariyê)
- Ji bo pêwendiya bi kes an sazgeha alîkariyê werdigre û herwisa komên di beşa 4b) û 4c) de hatine binavkirin
- Bi armanca lêpîrsînên nîrxandinê
- Bi armanca çavdêrî û şopandina encam û nîrxandina ne şexsî

4 Kîjan dane têne bikaranîn?

a) Kesên pêwendiya wan bi serlêder re heye, weke mînak ên alîkariyê werdigrin

- Agahdariyên têkiliyê yên kesa/kesê mafdarê îmzekirinê (Nav, erk, navnîşana E-Mail-ê, Telefon- hejmara Faksê)
- Agahdariyên têkiliyê yê kesa/kesê pêwendîdar (Nav, erk, navnîşana E-Mail-ê, Telefon- hejmara Faksê)

b) Karmenda/karmendê Daîreya Ciwanan ku berpirsiyarê şêwirmendî û çavdêriya pêşkêşkirî ye.

- Nav û paşnav
- Erk/wazife
- Navnîşana E-Mail-ê
- Navnîşana Daîreya Ciwanan (Jugendamt)

c) Agahdariyên karmendên wargeha zarokan (yên dahatû) û herweha karmendên demkî

- Nav û paşnav
- Rojbûn (roj, meh û sala ji dayikbûnê)
- Zayend

- Agahdariyên rewş û mercên kar û herweha (dema kar ya di hefteyekê de, diravê heqdestiyê)
- Navnîşana cîhê kar û şuxil û herweha wargeha kar

d) Agahdariyên kesa/kesê ji xwedîkirin û lêmiqatebûna zarok/zarokan berpirsîyar e û bi xwe beşdarî Kursa Integrasyonê dibe û yên zarok bi xwe

- Nav û paşnavê kesa/kesê sermiyan(kesa/kesê xwedî welayet) û nav û paşnavê zarok/zarokên miqate lê tê kirin
- Rojbûna(roj, meh û sala ji dayikbûnê) zarok/zarokên miqate lê tê kirin
- Navnîşana dê çavdêrî /miqate lê bête kirin
- Agahdariyên mafdariya beşdariya kursê yên kesa/kesê sermiyan
- Agahdariyên derbarê bi rêk û pêk beşdariya kursê yên kesa/kesê sermiyan

Dane dê ji aliyê serlêder an jî ji aliyê kesa/kesê di encamê de alîkarî werdigre rasterast li gel kesa/kesê pêwendîdar, an jî ji aliyê serlêder an jî ji aliyê wergirê alîkariyê bi xwespartina agahdariyên wan ên şexsî têne berhevkirin. Berhevkirina agahdariyên li jor binavkirî Ji bo kontrolkirina bicîhanîna mercên bikaranîna diravan û herweha kontrolkirina rast û di cîh de mesrefkirina diravên ji bo vê armancê hatine dayîn, pêwîst e. Weke prensîb, kesên pêwendîdar ne mecbûr in agahdariyan bidin. Lêbelê nedana agahdariyan dê bibe sedema redkirina serlêdanê, wekî dinê jî nedana agahdariyan dê ji sedema ku derfeta kontrolkirina bê ka ev alîkarî di cîh de ye yan na, ne pêkan be, di demên pêş de bibe sedema betalkirina alîkariyê.

Bingeha qanûnî ya bicîhanîn û bikaranînê xala 6. 1 lit.e DSGVO-yê ye(Bicîhanîn û bikaranîna erkeke ku di berjewendiya raya giştî de)ye

5 Wergirên daneyan kî ne?

Daneyên berhevkirî ji bo Weqfa SPI(ku beşeke ji ARGE GbR-ê ye), ji bo BMFSFJ, ji bo BAMF û ji bo BMI, ji bo rêxistinên bi nirxandin û şîrovekirinê erkdarkirî û herwisa ji bo Dîwana Çavdêriya Darayî ya Federal têne aşkerekirin.

6 Ev dane heta kengî têne parastin?

Bêyî girêdana bi pejirandina alîkarî û finansekirina projeyê daneyên şexsî, herî dereng piştî 31.12.2029 têne jêbirin.

7 Çi mafên kesên pêwendîdar hene?

Heke yek ji mercên xala 17. ya DSGVO-yê hebe, kesê pêwendîdar dikare daxwaza serreastkirina daneyên ne rast yên derbarê xwe de, yan jî daxwaza bi temamî jêbirina daneyên derbarê de xwe bike. Heke yek ji mercên di xala 18. ya DSGVO-yê hebe,

kesê pêwendîdar mafdar e ku bikaranîna daneyên derbarê xwe bisînor bike, di rewşa bicîhatina xala 20. ya DSGVO-yê mafê veguheztina daneyan dertê holê

Heke berhevkirina daneyan xwe bispêre benda 1. ya xala 6.ê(bicîhanîna erkên di berjewendiyên raya giştî herwisa bikaranîna karbidestiyêke fermî) an jî benda f-ê(bikaranîna daneyan ji bo parztina berjewendiyên meşrû), kesa/kesê pêwendîdar mafdar e ku herdem ji sedema rewşa xwe ya taybet îtiraz bike. Di rewşa îtirazê de, êdî daneyên şexsî ji bilî sedemên pêwîst ên ku maf azadî û bejewendiyên kesa/kesê xwediyê daneyan diparêzin an jî ji bo xizmet û piştrastkirina îdîayên qanûnî û parztina dadwerî ne tê de, nikarin bêne bikaranîn.

Heke kesên pêwendîdar bighêjin wê qenaet û baweriyê ku daneyên wan ên berhevkirî ne li gorî Biryarnameya Parztina Daneyan têne bikaranîn, dikarin serî li Erkdarê Parztina Daneyan û Azadiya Agahdariyan yê Berlînê (Friedrichstr. 219, 10969 Berlin) bidin.